zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

## KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



www.arsivakurdi.org

Sal: 1987

31

www.arsivakurdi.org

"Z A R O K   F Ê K I Y Ê   M A L A N E"



www.arsivakurdi.org

HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND

ÇÎROK Û MESELÊN XWE

JI WERE BÊJIN

KULÎLK

www.arsivakurdi.org

ROVÎYE FENEK Û MIRÎŞKA SOR (2)

Rovî xwe avêt ser mirîşkê,lê mirîşk bi hewa ket,xwe ji nav lepê wî xelaskir û xwe gîhand ser refikek bilind.



Bawerîya mirîşkê hat,ku rovî nikare xwe bighîne wê jorê û wê bigre.Ji bo wê yekê,meranî hat mirîşka sor û ji rovîre got:

-Ha,ha ! Tu nikare min bigre rovîyê fenek A baş ew e,ku tu wegere mala xwe.


Rovî li mîrşkê wegerand:

-Ez nikarim te bigrim ha ! Eme nuha bibînin.



www.arsivakurdi.org

Rovî destpêkir xwe zîz kir.Mirîşkê jî li wê jorê bi meraq li rovî dinerîya,ku bizanibê ma rovî dixwaze çi lîskê bîne serê wê.Rovî her li dora xwe dizîvirî û bê ku bisekine xwe zîz dikir. Serê mirîşka sor jî,bi zîvirandina rovî re dizîvirî.



Mirîşk serê wê gêj bû û ji jorde hat xwarê. Rovî kenya, devê telîsê xwe vekir û mirîşka sor ket telîsê rovî. Rovî bi kêf got:

-Min nikarîbû te bigirta ha ?





www.arsivakurdi.org

Rovî telîsê xwe avêt ser pişta xwe û berê xwe da şikefta xwe. Bi rêvde rovî westîya û ji bo rawestokê rawestîya.Rojek gelek germ bû.Rovî xwe li hevdu gerand û serê xwe danî ser terîya xwe.Gelek derbas ne bû,rovî ket xewek giran.Gava Rovî ket wê xewa giran,mirîşkê nerî deng ji rovî naye.Mirîşkê serê xwe ji telîs derxist,li derdora xwe nerî û bi lez ji telîs derket.



www.arsivakurdi.org

Mirîşk,piştî ku ji telîs derket,çend kevirên mezin xist telîs û bi lez vegerîya pînika xwe. Gava rovî ji xew rabû,wî nizanîbû,ku çi ha - tîye serê wî.Rovî telîsê xwe avêt ser pişta xwe û ket rêya xwe.



Gava rovîyê fenek xwe gîhand cem dîya xwe bi kêf û qêrîn bangî dîya xwe kir:

-Min ew mirîşka sor kirt. Ma av liser êgire ?


Dîya rovî lê vegerand:

-Erê kurê min.



www.arsivakurdi.org


Rovîyê fenek devê telîsê xwe vekir û kevirên mezin bera ser ava kelandî da.Kevirên mezin bi çelpînîyak mezin ket nav avê.Ava kelandî pijiqî ser rovîyê fenek û dîya wî û herdu bi carekê da mirin.
Mirîşka sor jî bi wî awayî ji rovîyê fenek xelas bû û jîyanek bi xweşî û bê tirs domand.



"Ev çîroka ji pirtûkek zaroka bi îngilîzî hatîye wergerandin.Hevîdarim ku ewê zarok jê hez bikin."

Bavê Hêvî

Di vî resmî de,teksîyak,kelekek,pûlek,firçak dirana,qedehek qahwê û kilîtek veşartîye.
Ma hun dikarin wan bibînin ?



www.arsivakurdi.org

QUNCİKA MUZÎK Ê.

NOTENİVIS: CEMÎLA CELÎL

**TE BI E'YŞIKA XIRDIK-MIRDIK** 19.




Te b(i) E'yşika xirdik-mirdik. lê, lê, E'yşê,
Te bi canika xirdik-mirdik. zalim E'yşê.

Ez h'eyrana bejna kurtik. lê, lê, E'yşê,
Ez h'eyrana bejna kurtik, zalim E'yşê.

Dergê mala we min biřî, lê, lê, E'yşê.
Dergê mala we min biřî, zalim E'yşê.

Qusêsya pez dibiřî, lê, lê, E'yşê.
Qusêsya pez dibiřî, zalim E'yşê.

Memkê E'yşa min k'irk'irî, lê, lê, E'yşê.
Memkê E'yşa min k'irk'irî, zalim E'yşê.

E'yş firotye ez bik'iřî, lê, lê, E'yşê,
E'yş firotye ez bik'iřî, zalim E'yşê.

Dergê mala we min vekir, lê, lê, E'yşê.
Dergê mala we min vekir, zalim E'yşê.

Dêrî veke, dêrî veke, lê, lê, E'yşê,
Dêrî veke, dêrî veke, zalim E'yşê.

Bejna delal xwe te'lde ke, lê, lê, E'yşe.
Bejna delal xwe te'lde ke, zalim E'yşe.

Şeva sarin p'axla xwe ke, lê, lê, E'yşê.
Şeva sarin p'axla xwe ke, zalim E'yşê.

www.arsivakurdi.org

QUNCIKA DÎROKA EDEBÎYATA KURDÎ
MELEYÊ CIZÎRÎ (2)

Di sala 1978 li Bexdadê zanyarê kurd Sadik Bahadîn Amedî têksta rexalgirî ya dîwana Meleyê Cizîrî çap kir.Sadik Bahadîn xên ji van dîwanan çend destnivîsarêd wê dîwanê dest xistibûn :

1- Dîwana bi fotokopî Fon Hartman sala 1904 li Bêrlînê çapkiribû.
2- Dîwana li Stembolê sala 1924 çapkiribû.
3- Dîwana li sala 1964 li Hewlêrê Gîvî Muqrîanî çap kiribû.
4- Dîwana li rûpelê kovara Hewarê da(Nr.35-38) li Şamê,sala (1941-1943) çapkiribû.
5- Dîwana destnivîsara Mele Tabî Bekir Elî Wanî ji Zaxo.
6- Dîwana destnivîsara Enver Mam Zaxoyî.
7- Dîwana destnivîsara Mehmed Ewnî.
8- Dîwana destnivîsara Mele Mehemed Botî Bizêvkî.

Prof.Qanatê Kurdo dinîvîse:"Berê piranîya zanyar û edebîyatnasêd kurd,Evropê dinivîsin,ku şêrêd Meleyê Cizîrî şêrêd sufîyêne, derheqa dînperestîya sufîyanda hatine nivîsaninê.Her bi tenê Wezîrê Nadîrî û Sadiq Bahadîn nivîse,ku dîwana Melê Cizîrî bi fikir û kakilê xweva pareve dibe ser du koman:Şêrêd evînîyê û şêrêd sufîyê.Lê bi fikira min şêrêd Meleyê Cizîrî bi piranîya xweva şêrêd evînîyêne,her nîve şêrêd wî yê sufîyêne...li

şêrêd wî sufîyêda gelek xeber û cumlêd erebî hene,ew baş nayêne fehmkirinê,lê şêrêd evînî yê gişk bi piranîya xweva bi kurmancîya xas, zarê şêrîn hatine gotinê û baş û rind têne fehmkirinê,xwerûya wan şêran ewe,ku di wan da gelek caran rêzêd derheqa jîyîn,ayîn,halê xelqê kurd da gotîye û lûvandîye...Li hinek şêrêd wî da wetenperwerî û neteweperwerîya wî têne ber çavêd xwendewaran.Bona nimûnê ez çend parçêd şêrêd Meleyê Cizîrî ji dîwana wî ya ku Sadiq Bahadîn li Bexdadê sala 1977-da çapkirîye,tînim ber çavan." (Tarixa Edebyeta Kurdî-1 rp. 90-95)

**DIL JI MIN BIR**

*Şoxê û şengê zuhre rengê,*
*Dil ji min bir, dil ji min bir,*
*Awurên heybet pilingê,*
*Dil ji min bir, dil ji min.*

*Wê şepalê miskî xalî,*
*Dêm dorê gerden şepalê,*
*Cehbeta biskan semalê,*
*Dil ji min bir, dil ji min.*

*Zulf û xalan nûn û dalan,*
*Wan ji min dil bir bi talan,*
*Goşeye qewsê helelan,*
*Dil ji min bir, dil ji min.*

*Dêm nedîrê bo enbîrê,*
*Xemrî û gîso herîrî,*
*Sîne kir armancê tîrê,*
*Dil ji min bir, dil ji min.*
*Sor şîrînî nazenînî,*
*Kuştim û nakit yeqînî,*
*Wê bi çengela evînê,*
*Dil ji min bir, dil ji min.*

*Fitil û taban da xuraban,*
*Ebleq û cohtê şebaban,*
*Dame ber pence û kulaban,*
*Dil ji min bir, dil ji min.*

*Xoş xeramê, ez xulamê,*
*Nazikê, şîrin kelamê,*
*Tutîya eyvan meqamê,*
*Dil ji min bir, dil ji min.(324-326)*
.......................

**WERE BINAHIYA ÇAVAN**

*Were,bînahîya çavan,*
*Bibînim bejn û balayê,*
*Zerîfê nazikî şengê,*
*Sifet horîyê, perî rengê,*
*Bi rojêra tu hevdengî,*
*Du reştozên sîyah rengî,*
*Kişandin, lê ne wek caran,*
*Xedengê qewsê nûbaran,*
*Ji rengê şîr û mukaran,*
*Weşand sîne wek baran,*
*Ji wê zerbê pir êşanim,*
*Sibah li xêr ya xanim,*
*Were binahîya çavan,*
*Bibînim bejn û balayê,*
*Veke carek xet û xalan,*
*Li ser van mesned û palan,*
*Bixûne, lê me ebdelan,*
*Bibînin eyd û sersalan,*
*Icazet de me destûrî,*
*Perî rengê, sifet horî,*
*Ji nîva zulmet û nûrî,*
*Binûşin mey di ferfûrî,*
*Ji dil talanê xalanim,*
*Sibah li xêr ya xanim,*
*Were bînahîya çavan,*
*Bibînim bejn û balayê.* (476-478)

Di nav herdu resman de 5 tişt newekhevin.
Ma hun dikarin wan bibînin ?



www.arsivakurd.org

## PEYVEN PEŞIYAN

12"Xwedê teala li gorê çîyan berf dibarînî.

13"Ereb û rez, Dumilî û pez?"

14"Derdê birçîyan tim nan e"

15"Eger tu kotî min pence, ez tu kena îşkence"

16"Ji gez qoşme nabî"

17"Merîyê pîs ji tiştê pis hez dike"

18"Mêranîya bê birînê, comerdbûna bê zewacê netaw e"

18"Ewê ku mêr bû, çi jin bû çi mêr bû"


19"Jin hene, jinik hene"

20"Hebîbê Necar, rakev fena her car,
Xwedê yek e, derge hezar"




www.arsivakurdi.org


NAVÊ WAN HEYWANAN LÎ BINÊ WAN BINIVÎSIN



.............



............



.............



.............




............



............



............



............

www.arsivakurdi.org

sa Besnê gelek bi nav û deng e...Li başûr tûtin,pembo û çeltûk tê çandin.Gelek rez lê hene.

Li çar alîyê mintîqê heywan tê xwedîkirin. Bi piranî bizin hene.Gelek deve,hesp û ker jî hene.

Mintîqe ji alîyê madenên bin erdê gelek dewlemende.Petrol,sifir û krom îro bi piranî tê xebitandin.

HEJMARA RUNIŞTEVANAN (NIFUS) :


Derheqa hejmara runiştevananên bajêr tiştê nivîsandinî gelek kêmin. 1895 de 8000. Li gor hejmara 1965 a 267.288 e. A nav bajêr û gûndê pêve 73.679 e.

DERDORE JI BO GERE :

Ji bo ku merov li Adiyemanê bigere,cîhê kevn bibîne û nasbike,dewleta Turka tu kar û bar ne kirîye.Derdora Adiyemanê xezîneyek dîrokîye.Gelek cîhên wê hene ku berî dîtina nivîsandinê jîyan lê hebû. Di nav wan cîhande jî ê herî tê naskirin Çîyayê Nemrûd û heykelên melîkên berêne.Ji bo merov karibe her serê çîyê,heta wan salên talî tu rê ji bo mekînan tunebû.Van salê talî bi xebata komelakê (Komela Turîzmê) rê hatîye çêkirin.

Li gor dîroknivîsan eserên Nemrûdê tu emsalên wan tunene.Li gor tê gotin,melîkê Sumera Gövsa,ji bo germa havînan vir wek havîngeh bi kar anîye. Melîkê Commagene Antiochos ji bo xwe mezelek û cîhekî îbadetê çêkirîye.Der-





www.arsivakurdi.org

dora mezel jî heykelên pir mezin daye çêkirin.

Bedena dora Adiyemanê jî eserek gelek kevne. Ji alî serleşkerên Ereban Hisnî Mansûr hatîye çêkirin.

FOLKLOR :

Govendên Adiyemanê mêzîkayî li derdora Meletê dikin. Lîskên herî tên naskirin Lorkê, Govend in.


Zilam şelwerê şînê tarî, gomlekên hevrêşim û bi ser de jî êlekên qeytankirî li xwe dikin. Ji dervî van, li serî desmal û li nava xwe jî piştê girêdidin.

Xwarinên Adiyemanê :

Kebabên bacanê reş, Çîx köfte, Tirşik, Cacixa Gergerê, helava bi penêr û dimsa Adiyemanê bi nav û dengin.

www.arsivakurdi.org

Di kîjan rêyê de merov dikane xwe bighîne wê asansora jorîn ?



www.arsivakurdi.org

## PÎR BÛM DİL PÎR NABÎ

Ey dilberê !
Peyxamberê
Lêv şekerê
Ka soz û peymana berê ?

Biskan veke
Zulfan şeke
Dil pîr meke
Mej'bîr meke
Carek ji pişt pêrdê derê

Dêmên diges
Çavên dires
Xalên hebeş
Birhên biweş
Hilde ko her, roj bê derê

Perdê ji ser
Xalên diqer
Hilde ku her
Roj bête der
Her kes bizanin vê sirê

Şêrîn kenê
Hingiv çenê
Dosta minê
Dil hasinê
Dil girtîyê te ez tenê

Gul wek devê
Lêv hingîvê
Min tim divê,
Roj û şevê :
Ez bêm cîvanê dêm dirê

Sîh sal temam
Ez bende mam
Hûnan meqam
Lê yek selam
Carek li ber çavan nedam


Ez bendeme
Perkende me
Şermende me
Perwane me
Sotim bi pêta agirê

Cigerxwîn




www.arsivakurdi.org


NAVEN WAN TÎŞTANAN LÎ BÎNE WAN BINIVÎSIN





.............  .............






.............  .............








.............  .............

www.arsivakurdi.org








| | | |
|---|---|---|
| 60+2+3 =...... | 28 + 2 + 4 =..... | 28+10+30 =..... |
| 90+8+2 =...... | 30+12+12 =..... | 40+10+10 =..... |
| 42+2+2 =...... | 30+25+22 = ... | 60+12+13 =..... |
| 34+6+8 =...... | 30+28+31 =..... | 30 + 8 + 2 =..... |

www.arsivakurd.org

# QUNCIKA XÊZIKA



# QUNCIKA PÊZANÎN Ê

Pirs: 1
Tişkî min heye tiştanok,
Kîskê kaba darda,
Deqê minî navda,
Ew çiye ?

Bersîv:............

Pirs: 2
Hêlva tê,kendêlva tê,
Porsorê hermêva tê,
Ew çiye ?

Bersîv:............


Pirs: 3
Lezê,bezê
Wekî fesal heve,
Wê merîya vegevize.
Ew çiye ?

Bersîv:............

Pirs: 4
Tişkî min heye tiştanok,
Ji ar hûrtire,
Ji deve bilintire,
Ew çiye ?

Bersîv:............


WAV HEJMARAN YEKO-YEKO BIGIHÎNIN HEV



www.arsivakurdi.org


DI NAV NEH RESMAN DE DUDU WEKHEVIN.

MA HUN DIKARIN BIBININ?




www.arsivakurd.org

# X A Ç E P I R S




www.arsivakurdi.org

# Q U N C I K A   P Ê Z A N Î N Ê

Pirs: 1
Şeşê reş,şeşê belek
Du boxin,donzdeh çêlek,
Ew çîye ?
Bersîv:..Sal.12.meh,,şev û roj

Pirs: 2
Av dinyayê têr dike,
Çi avê têr dike ?
Bersîv:.Lava.êvarê..


Pirs: 3
Kofîya xezalê,
Hol bû newalê,
Ew çîye ?
Bersîv:..Hîv.......

Pirs: 4
Kerî kete ser stêr.
Ew çîye ?
Bersîv:...Hîva.nîvî





www.arsivakurdi.org

## X A Ç E P I R S




6




1




2



4



5




3



7

www.arsivakurdi.org




www.aisvakurdi.org

KEREKÎ ME HEBÛ Û KUNDURKÎ ME

KERÊ ME KUNDURÊ ME KOT KOT KOT,

ME JÎ ÇÎROK Û MESELÊN XWE

YÊN VÊ HIJMARÊ JI WERÊ GOT

KULÎLK

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org




YAN

# KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

**KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING**

**WEŞANA KOÇ - KAK**

**KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ**

ADRESS - **NAVNÎŞAN**

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS
: 10:- skr
BIHA

www.arsivakurdi.org